Nirxandina Sempozyûmê / Sempozyum Değerlendirmesi / Symposium Review

# VI. Sempozyûma Kurdiyatê ya Navneteweyî Ebdurrehîm Rehmî Hekarî û Mîrasa Wî ya Çandî

## VI. Uluslararası Kurdiyat Sempozyumu Abdurrahim Rahmi Zapsu ve Kültürel Mirası

## VI. International Kurdiyat Symposium Abd al-Rahim Rahmi Hekkari and His Cultural Heritage

Destpêka sedsala 20an ji bo modernîzma kurdî serdemeke giring e. Wekî rewşenbîrên miletên ciyawaz ên di bin hukumraniya împeretoriya Osmanî de, rewşenbîrên kurdan jî ji bo modernîzma kurdî hewlên mezin dane, gavên giring avêtine. Stenbola paytexta împeretoriya Osmanî bûye navenda hewldan û pêngavên modernîzasyona kurdî. Kurdan jî wekî neteweyên din ên Osmanî bi avakirina rêxistin û komeleyan, derxistina rojname û kovaran di nava vê modernîsazyonê de cihê xwe girtiye û di kovar û rojnameyên xwe de ligel berhemên ramanî û siyasî berhemên edebî jî weşandine. Gelek rewşenbîrên kurdan pêşengiya vî karî kiriye. Vê yekê jî kiriye ku rewşenbîriya kurdî li Stenbola paytext ava bibe û xebatên xwe bi rê ve bibe. Yek ji wan rewşenbîrên kurd jî Ebdurrehîm Rehmî Hekarî ye ku têkilî bi rewşenbîrên kurd re daniye, di nava wan xebatan de cihê xwe girtiye. Wekî kesayetekî siyasî, ‘ilmî û edebî mohra xwe li wê serdemê xistiye û pêşengiya helbesta kurdî ya modern kiriye, ligel vê yekem şanonameya kurdî, *Memê Alan*, nivîsiye û weşandiye. Dema em li xebatên wî yên bi kurdî û tirkî dinêrin em dibînin ku Ebdurrehîm Rehmî Hekarî hem neteweperwerekî kurd e hem jî ummetperwerekî misilman e. Ji aliyekî di rojname û kovarên kurdî yên wekî *Jîn*, *Serbestî* û *Kurdistan*ê de nivîsar û helbestên wî yên kurdî û kurdewar li aliyê din jî di kovarên tirkî yên wekî *Sebillür-Reşad* û *Ehl-i Sünnet*ê de nivîsar û helbestên wî yên tirkî û îslamî weşiyane. Dîsa bi kurdî û tirkî pirtûkên dînî jî weşandine. Xebatên xwe yên îslamî piştî avabûna Komarê jî domandine. Di vî warî de wekî kesayetekî piralî derketiye pêş.

Ebdurrehîm Rehmî Hekarî, ji hêla edebiyata kurdî, dîroka rewşenbîrî û mîrata dînî ve kesayetekî pêşeng e. Ew hem yek ji nûnerên resen ê edebiyata kurdî ya modern e hem jî yê çerxa ramana îslamî ya piştî serdema Osmanî ye. Bi vê nasnameya xwe ya pirtebeqeyî, Hekarî ji aliyên xwe yên edebî, zanistî û siyasî ve di navbera fikriyata neteweperwer û ummetperwer de erka pireke damezrîner girtiye. Ji ber vê yekê, ji nû ve nirxandina mîrata wî dike ku em ne tenê kesayetiyekî, lê di heman demê de pêvajoya veguherîna ramana kurdî ya modern jî fam bikin. Ji ber van sedemên berbehs Ebdurrehîm Rehmî Hekarî şayanê vekolînên piralî ye ji aliyê xwe yê siyasî, ‘ilmî û edebî ve.

Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Enstîtuya Zimanên Jîndar di çarçoveya Sempozyûmên Kurdiyatê yên Navneteweyî de bi vê mebestê *VI. Sempozyûma Kurdiyatê ya Navneteweyî Ebdurrehîm Rehmî Hekarî û Mîrasa Wî ya Çandî* li dar xist.

BUYDED
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ
Yıl/Year: 2025 • Cilt/Volume: 11 • Sayı/Issue: 21

**Mehmet Yıldırımçakar**
memycakar@yyu.edu.tr
Dr. Öğr. Üyesi, Zanîngeha Yüzüncü Yıl,
Beşa Ziman û Çanda Kurdî
**Orcid:** 0000-0003-3565-1156

**Makale Türü /Article Type:**
Araştırma Makalesi / Research Article
**Makale Geliş Tarihi / Received:** 24.05.2025
**Makale Kabul Tarihi / Accepted:** 20.06.2025
**Makale Yayın Tarihi / Published:** 29.06.2025
**DOI**: 10.56491/buydd.1705515

Sempozyûmê hewl da ku hemû aliyên entelektûelî yên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî û mîrasa wî ya çandî derêxe meydanê, binirxîne û encaman jê derîne. *VI. Sempozyûma Kurdiyatê*, îsal jî wekî her salê di bin serokatiya *Enstîtuya Zimanên Jîndar ya Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê* de, bi temaya "Ebdurrehîm Rehmî Hekarî û Mîrasa Wî ya Çandî" hat lidarxistin. Ev sempozyumên Kurdiyatê hewleke giring dihewînin ji bo danasîn, vekolîn û hilsengandinan ên ku der barê kesayetên giring ên ziman, edebiyat û çanda kurdî de. Enstîtu armanc dike ku berdewamiyê bide van sempozyûman. Enstîtuya Zimanên Jîndar ya Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê heya niha tevî sempozyûma îsal şeş sempozyûm li dar xistine û bi rêzê temayên wan sempozyûmên Kurdiyatê wiha ne: *Zanistên Îslamî yên bi Zimanê Kurdî, Ehmedê Xanî û Mîrasa Wî, Feqiyê Teyran û Mîrasa Wî, Melayê Cizîrî û Mîrasa Wî, Mela Mehmûdê Bazîdî & Alexsandir Jaba û Mîrasa Wan* û *Ebdurrehîm Rehmî Hekarî û Mîrasa Wî ya Çandî.*

Wekî tê dîtin, sempozyûmên berê wekî tema li ser kesayetên kurd ên klasîk ên wekî Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran ü Mela Mehmûdê Bazîdî sekinîbûn lê çalakiya îsal berê xwe daye kesayetekî ji serdema modern yê ku di warên edebiyat, zanistên olî, rojnamegerî û hilberînên pedagojîk de têkariyên piralî kiriye. Sempozyûm ji çalakiyeke ku bi tenê teblîxên akademîk dicivîne vêdetir digel vekoler û nivîskarên ji welatên cuda cuda hatî û neviyên Hekarî veguherî civîneke bîrê ku tê de aliyên dîrokî, çandî û siyasî ketibûn nav hevûdu. Çalakiyê, bi qasî nivîsên Hekarî yên edebî, li ser nasnameya wî ya perwerdekar, nerînên wî yên dînî, têkiliyên wî yên nakok ên bi modernîzasyonê re û cihê wî yê di avakirina hişmendiya neteweyî de jî gelek nirxandinên giranbiha kir û têkariyên hûrbînî pêşkêş kir.

Wekî her sal çapemeniyê îsal jî eleqeyeke mezin nîşanî sempozûmê da û sempozyûm ji hêla gelek ajansên navneteweyî ve hate şopandin: Hem di çapemeniya herêmî û neteweyî de û hem jî di çapemeniya navneteweyî de der barê sempozyûmê de gelek nûçe hatin belavkirin, bi pêşkêşvan û akademîsyênên ji lijneya amadekar re hevpeyvîn hatin kirin.

Salên borî Nevzat Eminoğlu *IV. Sempozyûma Kurdiyatê*, Sinan Çakar jî *V. Sempozyûma Kurdiyatê* nirxandibûn nivîsarên xwe di kovareke hekemî de weşandibûn. Eminoğlu di nirxandina xwe de balê dikişîne ser giringiya van rêzesempozyûmên Kurdiyatê: Li Tirkiyeyê lidarxistina sempozyûmên li ser kesayetên mezin, şa'ir û nirxên kurdan ji aliyê zanîngehên dewletê ve gelekî giring in. Ev rêzesempozyûmên Kurdiyatê ku ji hêla Enstîtûya Zimanên Jîndar a Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê ve tên lidarxistin xeyalên kurdan ên sedsale tînin cih (2023, r. 79). Çakar di nirxandina xwe ya navborî de bi vî awayî balê dikişîne ser giringiya van rêzesempozyûmên Kurdiyatê: Enstîtûya Zimanên Jîndar a Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê di qada sazkirina sempozyûman de kedeke mezin xerc dike. Bi saya van rêzesempozyûman ji aliyekî ve mijar û şahkarên edebiyata kurdî tên guftûgokirin û ji aliyê din ve jî rol û mîsyona wan di zanista akademiyê de tê pêşkêşkirin (2024, r. 119). Çakar destnîşan dike ku ev çalakiyên akademîk ên bi vî rengî bi xwe re tevgerekê jî ava dikin. Lewra ji gelek zanîngehan vekolerên kurd û yên biyanî dicivin û hevdu nas dikin. Ev yek jî dike ku di navbera wan de pirek ava bibe (2024, r. 119).

Ev nivîsara nirxandinê armanc dike ku bi nirxandineke rexneyî ya rûniştinan, naveroka pêşkêşiyan, teblîxên akademîk û rêxistina giştî ya sempozyûmê, têkariyên sempozyûmê yên di warê Kurdiyatê de eşkere bike. Wekî din, ji bo sempozyûmên siberojê dê hem ji hêla naverokê ve û hem jî ji hêla avaniyê ve balê bikişîne ser xalên bihêz û qels ên sempozyûmê û her wiha dê pêşniyaran jî pêşkêş bike.

Wekî me di destpêke de jî diyar kiribû mijara sempozyûmê ya îsal Ebdurrehîm Rehmî Hekarî û mîrasa wî ya çandî bû. Ebdurrehîm Rehmî Hekarî ku di dîroka edebiyata kurdî û ramana îslamî de cihekî giring digire, bi awayekî piralî di sempozyûmê de hat nîqaşkirin. Sempozyûm li *Navenda Çandê ya Prof. Dr. Cengiz Andiç*ê hat lidarxistin. Rektorê Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê Prof. Dr. Hamdullah Şevli, Şêwirmenda Serokkomar Gülşen Orhan, neviyên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî Dicle Anter û Hasan Cuneyd Zapsu, gelek nûnerên partiyên siyasî, akademîsyen, nivîskar, vekoler, zanyar, karsaz, nûnerên rêxistinên civaka sivîl û xwendekarên zanîngehê beşdarî sempozyûmê bûn. Sempozyûmê du rojan berdewam kir û bi beşdariya 48 akademîsyenên ji 13 zanîngeh û saziyên curbicur ên li Tirkiye, Swîsre, Îngilîstan û Iraqê pêk hat û di sempozyûmê de 36 teblîx hatin pêşkêşkirin. 33 teblîx bi awayekî rûbirû û 3 jî bi awayekî liserxetê (online) bûn. Tevahiya sempozyûmê li ser kanala *Kurdiyat Dergisi* ya Youtubê[1] bi awayê zindî hat weşandin.

1 Url: https://www.youtube.com/@kurdiyatdergisi/streams.

## 1. Axaftinên Destpêkê

Axaftina pêşîn a destpêkê ji hêla *Rêvebirê Enstîtuya Zimanên Jîndar*, Prof. Dr. Abdulhadi Timurtaş ve hat kirin. Timurtaş bal kişand ser giringiya keşifkirina mîrasa ziman, edebiyat û çanda kurdî û wiha got: Enstîtuya Zimanên Jîndar bi hişmendiya *asêmana di rabirdûyê de xelet e, her weha nenaskirin û paşguhkirina rabirdûyê jî xelet e* keşfa mîrasa der barê ziman, edebiyat û çanda kurdî de berdewam dike. Em xweşhal in ku bi *VI. Sempozyûma Kurdiyatê ya Navneteweyî* bi we re ne. Çawa ku sedsala 19an ji bo gelek raman û edebiyatan xaleke werçerxanê bû û destpêka serdemeke nû bû, ji bo ziman û edebiyata kurdî jî her wisa bû. Her çendî Ebdurrehîm Rehmî Hekarî di dawiya serdema Osmanî û destpêka serdema Komarê de di nav ekolên edebî û rewşenbîrî de cihekî giring girt û di avakirina ekola ramana îslamî ya wê serdemê de bi awayekî çalak tev geriya, ji ber hin sedeman, Ebdurrehîm Rehmî Hekarî ji aliyê dîroknas û rexnegiran ve hat paşguhkirin yên ku li ser ekolên ramanî û edebî diaxivîn. Me îsal *Ebdurrehîm Rehmî Hekarî û Mîrasa Wî ya Çandî* kire temaya sempozyûma xwe û zanyarên vê qadê vexwendin da ku mîrata wî ya çandî, edebî û zanistî nîqaş bikin. Ebdurrehîm Rehmî Hekarî kesayetekî neteweperwer e ku xizmeta edebiyat, çand û zimanê miletê kurd kiriye, yek ji mîmarên pêşeng ê edebiyata kurdî ya modern e. Her wiha zanyarekî îslamê ye ku hewl daye miletê wî îslamê rast fam bike û bi awayekî rast bijî. Ebdurrehîm Rehmî Hekarî qehremanek e ku ji bo parastina welatê xwe li dij ûrisên dagirker ên wê serdemê şer kiriye, rewşenbîrekî piralî ye ku beşdarî raman û edebiyata wê serdemê bûye, perwerdekarek e ku nifşên ciwan perwerde kiriye. Dibe ku ji ber têkoşîna xwe ya ji bo van hemî pirsgirêkên dînî û neteweyî ew hatiye bindestkirin û marjînalîzekirin, ji ber vê yekê wî xemgîniya xwe wiha aniye ziman:

*Ez bilbil bûm di baxê kurdan*
*Qijikan heyat li min kir zindan*

Di helbestên xwe yên bi kurdî û tirkî de, wî gelek mijarên wekî evîna pêxember, şîret, hîkmet, dînperwerî, evîna welat û hwd. nîqaş kirine. Ebdurrehîm Rehmî Hekarî di wê baweriyê de bû ku divê kurd jî wekî her miletekî wê serdemê perwerdehiyê bi zimanê xwe bigirin. Wî bi vê amancê projeyek ji bo amadekirina pirtûkên dersê yên kurdî pêk anî û çend pirtûkên dersê jî temam kirin. Berhema wî ya bi navê *Büyük İslâm Tarihi*[2] ku bi tirkî nivîsiye çavkaniyeke giring a vê qadê ye. Wî, Kovara *Ehl-i Sunnet*ê -ku wî diweşand- ji bo vexwendina dînê îslamê wekî minberekî dîtiye. Wekî Enstîtuya Zimanên Jîndar, em kêfxweş in ku kesayetekî wisa tînin rojeva cîhana zanistî û hewl didin ku mîrata wî ya çandî kifş bikin. *Kurdiyat* hem bi kovara xwe ya akademîk hem jî bi rêzesempozyûmên xwe êdî bûye markayek û dikare bê gotin ku êdî dilê zanista *Kurdiyat*ê li Wanê lê dide, ev yek jî berpirsiya me zêdetir dike.

*Rektorê Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê* Prof. Dr. Hamdullah Şevli, spasiya lijneya amadekar kir. Diyar kir ku ji bo Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê cihê şanaziyê ye ku berhem û mîrata rewşenbîrî ya Abdurrahim Rahmi Zapsu, ku berî û piştî Komarê di kombûna ramana îslamî ya Tirkiyeyê de xwedî cihekî mistesna ye, li ser platformeke akademîk vebikole, nîqaş bike û vê kombûnê veguhêze nifşên siberojê. Got: Ji bo me hem berpirsiyeke akademîk hem jî civakî ye ku em nirxên xwe yên civakî, dîrokî, siyasî, hunerî, çandî û edebî di çarçoveyeke zanistî de vebikolin, van nirxan ji nû ve şîrove bikin û kombûna kûr a şaristaniya xwe pê dewlemendtir bikin û wan bigihînin siberojê.

Şevli diyar kir; zanîngeh ew cih in ku zanist û aqil di atmosfereke ramana azad de geş dibin û hilberîna zanînê ji civak û mirovahiyê re xizmetê dike. Em bi navê Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, bi hişmendiya vê berpirsiyê tev digerin û amanc dikin ku bi xwedîkirina nerîta zanîna kevnar a erdnîgariya ku em lê ne, pozîsyona xwe ya navdar a neteweya xwe di cîhanê de bi hilberîna zanistî xurt bikin. Ev sempozyûm nîşaneya vê hewldanê ye û nîşaneyeke berbiçav û hêja ya îradeya çareserkirina dewlemendiyên me yên çandî ye bi perspektîfeke gerdûnî. Dema ku em li naveroka bernameyê dinêrin, em pir kêfxweş û hêvîdar in ku zanyarên di qada xwe de jêhatî, dê bi teblîxên kûr û piralî beşdarî mijara sereke ya sempozyûmê bibin. Ez bawer dikim ku civînên akademîk ên bi vî rengî ji bo têgihiştineke zeximtir û kûrtir a mîrata me ya çandî û ji bo veguhastina wê ji nifşên siberojê re pir giring in.

2 Dîroka Îslamê ya Gewre.

*Şêwirmenda Serokkomar* Gülşen Orhanê diyar kir ku Abdurrahim Rahmi Zapsu hema bêje her roj li ser ekseneke berfireh a ramanan ezmûnên tal û şîrîn daye û berhemên bêhejmar nivîsîne. Ev yek jî nîşaneya îradeyeke mezin e. Wî rewşenbîrên mezin ên wê serdemê yên wekî Necip Fazıl û Seîd-ê Nursî nas kiriye, bûye hevalê wan û her gav ya rast aniye ziman. Li gorî vê, taybetmendiya ku Zapsu ji ramanwerên îro cuda dike û wî bi nasnameyeke bilind di xeta fezîleta wijdana cîhanê de pênase dike ev e ku xala wî ya bingehîn a piştgiriyê exlaq e. Serpêhatiya Abdurrahim Rahmi Zapsu ya hînbûna elmanî û ûrisî di bin şert û mercên dîlgirtinê de, piştî erebî û farisî, ku li repertuwara wî ya xwemalî ya kurdî hatin zêdekirin, li axa Ûrisyayê yên ku ew lê dîl hatibû girtin jî pir berbiçav bû.

Hasan Cuneyd Zapsu, neviyê Abdurrahim Rahmi Zapsu, jî serpêhatiyên li ser jiyana bapîrê xwe parve kir. Zapsu bal kişand ser zilm û zordariya ku kurdan û zimanê kurdî di serdema Komarê de dîtiye: Li Tirkiyeyê di salên 1950an de bifikirin û çend malbatên kurd ên ku li bajarên mezin dijîn ji tirsa, kurdî hînî zarokên xwe yên biçûk nekirin. Ev xemgîniyeke mezin e, nemaze ji bo hişên piçûkan, ew dikarin du-sê zimanan di cih de hîn bibin. Her ziman, wekî ku hûn dizanin, çandeke cuda jî hîn dike. Ez pir xemgîn im, nemaze min navên gelek profesoran li vir dîtin, di heman demê de hûn dikarin hin berhemên bapîrê min Ebdurrehîm di forma wan a orîjînal (kurdî) de bixwînin lê ez nikarim, her çiqasî ez dikarim gelek zimanên biyanî wekî ku zimanê dayika min bin fam bikim jî. Ev rewşa han pirsgirêkên serdemeke welatê me bi zelalî derdixe pêş çavan. Tesadûfeke pir xweş e ku ev sempozyûm niha tê lidarxistin, di berbanga pêşketinên siyasî de ku ez ji bo guhertinên erênî yên sosyolojîk, çandî û aborî yên giring dua dikim. Cuneyd Zapsu axaftina xwe bi vê hevokê bi dawî kir; bapîrê min ew kes bû ku ne tenê bi ramanên xwe, lê di heman demê de bi kar û xebatên xwe jî dikaribû li dij hemî qedexeyan tev bigere.

Mêvanê rûmetê yê sempozyûmê Dr. Mehemed Malmîsanij[3] bû. Ew yek ji navên rêzdar e di warê Kurdiyatê de. Malmîsanij, di konferansa vekirinê de axaftinek berfireh pêşkêş kir li ser bandora herêmî û çandî ya Ebdurrehîm Rehmî Hekarî. Malmîsanij li ser çapemeniya kurdî ya serdema Osmanî sekinî, der barê wan mijaran de agahiyên giştî dan. Her wiha behsa kar û xebatên Ebdurrehman Rehmî Hekarî, berhemên wî kir. Piştî axaftinên destpêkê plaketa lijneya şerefê pêşkêşî Hasan Cuneyt Zapsu û plaketa mêvanê şerefê jî pêşkêşî Dr. Mehemed Malmîsanij kirin. *VI. Sempozyûma Kurdiyatê ya Navneteweyî* du rojan bi teblîxên li ser nasname û mîrata çandî ya piralî ya Ebdurrehîm Rehmî Hekarî di aliyên cuda de sekinî. Sempozyûm ji *axaftinên destpêkê* dest pê kir û bi *neh* rûniştinên cuda berdewam kir û bi *rûniştina nirxandinê* bi dawî bû. Roja înê piştî nîvro *sê* rûniştin, *şeş* rûniştin jî roja şemiyê pêk hatin. Roja înê êvarê piştî şîvê *sevbihêrka dengbêjan* hat lidarxistin. Şeva şemiyê beşdarên sempozyûmê beşdarî *dîwana dengbêj Îsmaîlê Seyranê* bûn. Piştî sempozyûmê roja yekşemê mêvan beşdarî *gera Girava Extirmeyê* bûn, piştî gerê mêvanan firavîn xwarin û piştî xwarina firavînê beşdaran xatir ji hev xwestin û vegeriyan welat û bajarên xwe.

## 2. Rûniştinên Sempozyûmê

Sempozyûn ji neh rûniştinên serbixwe û rûniştina nirxandinê pêk hat. Di her rûniştinê de li dor temayên nêzî hev teblîxên cur bi cur hatin pêşkêşkirin.

### 2.1. Rûniştina Yekem

Rûniştin bi serokatiya Doç. Dr. Zafer Açar bi rê ve çû. Di vê rûniştinê de çar teblîx hatin pêşkêşkirin. Teblîxên vê rûniştinê zêdetir li ser mijarên giştî bûn. Prof. Dr. Tahirhan Aydın di teblîxa xwe ya bi navê *Motîvasyon û Xebatên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî ji bo Zimanê Kurdî* de li ser faktorên sereke yên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî sekinî, ên ku han dane ku berê xwe bide xebatên li ser zimanê kurdî. Aydın diyar kir ku Ebdurrehîm Rehmî Hekarî bi kurdî û tirkî nivîsar û helbest nivîsîne, dîsa yekem şanonameya kurdî nivîsiye lê Ebdurrehîm Rehmî Hekarî ne bi tenê nivîsiye her wiha di nav sazî, komele û rêxistinên kurdî de jî cih girtiye û bûye yek ji sazkerên wan. Bi vî awayî wekî kesayetekî aksiyoner û çalak derketiye pêş. Aydın motîvasyonên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî wiha rêz kirin: Evîna welat, rûmet û namûsa kurdbûnê, berpirsiya dînî, referans û krîterên mafên mirovan ên navneteweyî, berawirdiya bi miletên din re, tirsa ji windabûn û tunebûna kurdan, rewşa kurdan a xirab.

3 Dr. Mehmet Tayfun, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Tirkiye.

Doç. Dr. Ayhan Tek jî bi teblîxa xwe ya bi navê *Biyografiya Ebdurrehîm Rehmî Hekarî û Guherîna Nasnav û Fikrên Wî di Têperîna Qonaxan da* li ser herdu nasnameyên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî, kurdperwerî û îslamperwerî, sekinî. Tek bal kişand ser dîroknûsiya malbatê: Çawa ku beriya Ebdurrehîm Rehmî Hekarî bi sîparîş dîroka mîrektiya Hekariyê[4] hatiye nivîsîn her wiha piştî mirina Ebdurrehîm Rehmî Hekarî jî çerxa nivîsîna dîroka malbatê bi rêya endamên malbata wî berdewam kiriye, bi nameyan siparîş dane ku dîroka malbatê bê nivîsîn. Bi vî awayî ew tradîsyona dîroknûsiyê her tim berdewam kiriye. Tek, herdu nasnameyên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî, dîndariya Ebdurrehîm Rehmî Hekarî û kurdperweriya wî, şiband du çeman ku di nav çemekî de hasilî hev dibin. Li gorî Tek, ev hevdu qonaxên jiyana wî ji hevdu cuda û dûr nînin. Dîsa li gorî Tek, Ebdurrehîm Rehmî Hekarî di gelek nivîs û xebatên xwe de dînperwer e lê di nava berhemên wî de propagandayeke dînî nayê dîtin anku Ebdurrehîm Rehmî Hekarî ne îslamîst e. Tek, destnîşan kir ku Ebdurrehîm Rehmî Hekarî hema bêje hemû berhemên xwe yên berî Komarê bi kurdî nivîsîne lê piştî Komarê, bi taybetî jî piştî Serhildana Şêx Seîd dengê wî yê kurdî biriyaye û exleb li ser meseleyên dînî serê xwe êşandiye. Û balkêş e ji bo her zarokeke xwe berhemeke dînî nivîsiye. Gelek nivîskar û îlahiyatnasên wê serdemê pesnê pirtûka wî ya li ser dîroka îslamê[5] dane. Dîsa Ebdurrehîm Rehmî Hekarî di sala 1921ê de ji bo zarokan pirtûkeke li ser dersên dînî nivîsiye û piştî wî, îdeologên Komarê di sala 1927an de encax karîne vê yekê bikin. Tek bal dikişîne ser sansûra rojnameya *Serbesti*yê ya li ser helbesta wî ya kurdî. Tek, îdîa kir ku ji bo em wan serdeman fam bikin ew ên ku Ebdurrehîm Rehmî Hekarî tê de jiyaye, divê em bi baldarî li metnên wî binêrin.

Serokê *Enstîtûya Kurdî ya Lozanê*, nivîskar û vekoler Necat Zanyar ku hemû berhemên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî yên berdest[6] tomar kirine û çap kirine, bi teblîxa xwe ya bi navê *Otobiyografiya Ebdurrehîm Rehmî Hekrarî ya Neweşandî* beşdarî sempozyûmê bû. Zanyar teblîxa xwe bi awayê liserxetê (online) kir. Mijara teblîxa Zanyar otobiyografiya Ebdurrehîm Rehmî Hekarî bû ku heya niha neweşiyaye. Li gorî ku agahiyên Zanyar da, di meha Gulana sala 1945an de Ebdurrehîm Rehmî Hekarî bi sernavê *Ailemin Tarihi ve Heyecanlı Sergüzeştlerim*[7] dest bi otobiyografiya xwe dike lê ev destnivîsa wî nîvco dimîne û nayê weşandin. Bi tenê 26 salên jiyana xwe yên pêşîn bi awayekî tematîk û kronolojîk dinivîse. Lê ji ber şert û mercên siyasî otosansûrek li otobiyografiya xwe kiriye û cih nedaye wan salên ku jiyana xwe di nav kar û barên kurdperweriyê de derbas kiriye. Li gorî Zanyar, Ebdurrehîm Rehmî Hekarî 121 pirtûk-pirtûkçe nivîsîne, di nava lijneyên gelek weşanan de cih girtiye, birêvebiriya gelek sazî û dezgehan kiriye, danzdeh salan mamostatî û panzdeh salan jî malmidûrî kiriye. Otobiyografiya xwe ji ber hin endîşeyan neweşandiye lê piştî 80 salan[8] dê otobiyografiya wî biweşe. Ev yek jî trajediyeke rewşenbiriya kurdî nîşan dide. Ya ku otobiyografiya Ebdurrehîm Rehmî Hekarî derdixe pêş şahidiyên wî ne, yên ku der barê Şerê Cihanê yê Yekem de. Ev yek jî vê otobiyografiyê dike otobiyografiyeke tekane. Zanyar mizgîniyê dide ku dê îsal, di demeke nêz de wekî pirtûk vê otobiyografiyê biweşîne.

Nivîskar û vekoler Seîd Veroj di teblîxa xwe ya bi navê *Ebdurrehîm Rehmî Hekarî û Xebata Wî ya li ser Zimanê Kurdî û Pirtûkên Perwerdehiyê* de li ser xebatên wî yên beriya ragihandina Komarê sekinî û fokûsa xwe bir ser pirtûkên wî yên ji bo dersan. Veroj, diyar kir ku beriya Ebdurrehîm Rehmî Hekarî gelek rewşenbîrên kurd ên wekî Ömer Avni Efendi, Mela Seîdê Kurdî, Hemdî Silêmanê Ezirganî, Mihemed Mihriyê Sineyî û hwd. li ser perwerdehiya bi zimanê kurdî hûr bûne û nivîsarên cihêreng nivîsîne. Dîsa gelek cemiyet têne avakirin û dibistaneke kurdî vedikin, mifredat û materyalên ji bo perwerdehiya zimanê kurdî têne amadekirin. Ebdurrehîm Rehmî Hekarî jî yek ji van rewşenbîran e ku di vî warî de xebitiye, di nav wan rêxistinan de cih girtiye, mamostatiya kurmanciyê ya Noel[9] jî kiriye. danzdeh pirtûk amade kirine lê sê ji wan çap bûne: *Kilîla Xwendinê, Aqîda Îmanê* û *Dersa Dîn*. Dîsa gelek nivîsarên wî di vî warî de hatine weşandin.

4 Mîrnameya Hekaryan ji hêla Temerxanê Yazicî ve di sala 1633an de bi farisî hatiye nivîsîn û di sala 2022an de bi wergera M. Xalid Sadînî, bi kurdî ji nav weşanên Peywendê der çûye.

5 Büyük İslam Tarihi.

6 Zapsu, A.R. (2023). Abdurrahim Rahmi Zapsu Çok Yönlü Bir Tanıklığın Öyküsü (Lêkolîn. Necat Zanyar). İstanbul: Doğan Yayıncılık.

7 Dîroka Malbata Min û Serpêhatiyên Min ên Bikelecan.

8 1945-2025.

9 Edward William Charles Noel, (1886 - 1974), efserê îstîxbaratê yê Brîtanî ku di dema Agirbesta Mondrosê de li Kurdistanê xebitî (Url2).

## 2.2. Rûniştina Duyem

Rûniştin bi serokatiya Doç. Dr. İlyas Suvağci bi rê ve çû. Di vê rûniştinê de çar teblîx hatin pêşkêşkirin. Teblîxên vê rûniştinê zêdetir li ser dahûrînên tematîk bûn. Doç. Dr. Mehmed Emin Purçak di teblîxa xwe ya bi navê *Lêkolîneke Tematîk li ser Helbestên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî* de qala giringiya bi rêk û pêk nivîsîna helbestên kurdî yên modern kir û li ser temayên wekî hezkirina Kurdistanê, bawerî, bindestiya kurdan û sedemên wê û yekîtî û azadiya kurdan û Kurdistanê bi hûrgilî sekinî yên ku di nav helbestên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî de derdikevin pêş. Doç. Dr. Mehmed Yonat bi teblîxa xwe ya bi navê *Di seriya "Gaziya Welat" a Ebdurrehîm Rehmî Hekarî de Analîza Konsepta Welêt di Çarçoveya Rastiya Dîrokî û Civakî de* tevli sempozyûmê bû. Di konsepta *em* û *êndin* de helbestên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî analîz kirin. Li gorî tesbîtên Yonat koma emê ji kurd (ên sunnî) û misilman û koma êndin jî ji nemisilman û nekurdan pêk tên. Lê her çiqasî kesên wekî Ziya Gökalp û Dr. Abdullah Cevdet kurd jî bin ji ber helwesta wan û nêzîkatiya wan a bi îttîhad terakkî û kemalîzmê ve heyî bûye sedem ku di bin koma êndin de hatine şayesandin. Dîsa ermen her çiqasî ne kurd û misilman jî bin ên bi îttihad terakkiyê re naxebitin dîsa di bin koma emê de cih digirin. Dîsa behsa kurdên ne sunnî ên elewî, êzidî û yaresan nehatiye kirin. Doç. Dr. Osman Aslanoğlu teblîxeke bi navê *Mijarên di Helbestên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî da* pêşkêş kir. Aslanoğlu mijarên helbestên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî di sê kategoriyan de analîz kirin: Nexweşî, encam û derman. Di bin banê *nexweşiy*ê de *nezanîn, feqîrî, cudatî* û *xemsariya dînî*; encama van *nexweşi*yan jî wekî *nenaskirina dijminan, nezanîna mafên xwe, perîşanî, bêxwedîtî, fikirîna ji kêfa şexsî* û *dûrketina ji dîn* derketine holê. Herçî *derman*ên ku pêşniyaz dike jî ev in: *Hîmmeta millî, hessasiyeta dînî, perwerdehî, xwendin, xebat, 'ilm, huner, perwerdeya zarokan, terbiyeya dayîkan*. Dr. Ahmet Seyari teblîxeke bi navê *Welatperwerî di Helbestên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî da* pêşkêş kir. Seyari pêşkîşiya xwe di çarçoveya *teoriya etno sembolîst* a neteweperweriyê de kir. Di bin banê pênç temayên sereke de li ser welatperweriya Ebdurrehîm Rehmî Hekarî hûr bû: *Evîn û hesreta welat, tifaq û yekîtiya ji bo welat, pesnê welat, fedakarî û parastina welat* û *perîşanî û paşdemayîna welat*.

## 2.3. Rûniştina Sêyem

Rûniştin bi serokatiya Prof. Dr. İbrahim Bor bi rê ve çû. Di vê rûniştinê de çar teblîx hatin pêşkêşkirin. Teblîxên vê rûniştinê zêdetir li ser folklor, edebiyata devkî û destanan bûn. Doç. Dr. Kenan Subaşı teblîxeke bi navê *Varyanteke Destana Kela Dimdimê di Kitêbxaneya Taybet ya Ebdurrehîm Rehmî Hekarî da* pêşkêş kir. Subaşı ev varyanta navborî digel varyantên din ên berbidest berawird kir. Bi tesbîta Subaşı ev varyant ji ber ku varyanteke kevn e, bi destxeta Ebdurrehîm Rehmî Hekarî hatiye nivîsîn, ji hêla naverokê ve jî cudahî hene digel varyantên din û varyanteke serbixwe û giring e. Doç. Dr. Yaşar Kaplan bi teblîxa xwe ya bi serenavê *Nirxandinek der Barê Yekemîn Dramaya Kurdî û Jêdera Wê ya Gelêrî de* beşdarî sempozyûmê bû. Bi tesbîta Kaplan, folklora kurdî çavkaniyek e ji bo edebiyata kurdî ya nivîskî, gelek kereste dane/dide edebiyata nivîskî û bûye/dibe îlham ji bo afirandina berhemên nû. Ebdurrehîm Rehmî Hekarî jî ji serhatiya *Mem Ebasî* ku ji folklora kurdî tê îlhamê digire û şanonameya xwe ya bi navê *Memê Alan* dihone û li gorî şert û mercên serdema xwe û perspektîfa xwe kirasekî îslamî lê dike. Ev çîroka folklorîk di serdema Sovyetê de jî wekî *Memê û Eyşê* dîsa bi kirasekî sosyalîst-komunîst hatiye modernîzekirin û weşandin. Her wiha çendek mînakên din ên vê çîrokê yên modern jî hene. Ev çîroka folklorîk bi destê van îdeologan di şêweya şanonameyên modern de hatine nîvîsîn û weşandin. Kaplan di teblîxa xwe de paşxaneya dîrokî ya çîroka folklorîk ronî kir û li gorî qeneata Kaplan, Memê bi îhtîmaleke mezin mîrzadeyek e ji malbata mîrên Hekariyan vê yekê jî kiriye ku meyla Ebdurrehîm Rehmî Hekarî here vê çîroka folklorîk da ku ji bo şanonameya xwe bibijêre û şanonameya xwe li ser bingeha vê çîrokê bihone.

Dr. Ömer Delikaya di teblîxa xwe ya bi navê *Destana ku Îlham Daye Yekem Şanoya Kurdî Memê Alan a Zapsu: Memê Ewan* de li ser pêwendiya Şanonameya Ebdurrehîm Rehmî Hekarî ya bi navê *Memê Alan* ya bi çavkaniya devkî destana *Memê Ewan* an jî *Memê û Eyşê* vekola û du varyantên destanê nirxandin; yek varyanta herî kevn a nivîskî ku Albert von Le Coq (1903) berhev kiriye û yek jî varyanta prosîmetrîk a destanbêjê Efrînî Elê Kapê (1925-2005) bi tevî enstrumanê îcra kiriye. Delîkaya destnîşan kir ku berhema şanoyî ji ber destana bi navê *Memê Ewan* an jî *Memê û Eyşê* hatiye lêanîn û nivîskar gelek hêmanên neteweyî û dînî li naveroka wê zêde kiriye û berhema devkî gelek veguherandiye. Dr. İbrahim Tarduş bi teblîxa xwe ya bi navê *Têgihiştina*

*Dîroka Kurdan di Berhemên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî de* li ser berhema Ebdurrehîm Rehmî Hekarî ya bi navê *Perek Zêrîn ji Tarîxê* disekine. Tarduş ji ber ku ev berhem bi awayekî helbestî hatiye nivîsîn û di sala 1945an de anku piştî Komarê hatiye nivîsîn giring e. Ev tişt nîşaneyeke berbiçav e ku Ebdurrehîm Rehmî Hekarî piştî Komarê jî bi awayekî ne eşkere jî be kurdbûna xwe parastiye, helwesta xwe ya kurdewar a beriya Komarê nîşan daye. Piştî vê rûniştinê teblîxên roja yekem a sempozyûmê qediyan. Roja duyem a sempozyûmê bi şeş rûniştinên têr û tije berdewam kir û bi rûniştina nirxandina sempozyûmê bi dawî bû.

## 2.4. Rûniştina Çarem

Rûniştin bi serokatiya Prof. Dr. Hasan Tanrıverdi bi rê ve çû. Di vê rûniştinê de pênc teblîx hatin pêşkêşkirin. Teblîxên vê rûniştinê zêdetir li ser aliyên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî yê dînî û xebatên wî yên perwerdehiyê bûn. Prof. Dr. Mustafa Özkan bi teblîxa xwe ya bi navê *Abdurrahim Rahmi Zapsu'nun Siyer Anlayışı*[10] de têgihiştina Abdurrahim Rahmi Zapsu ji siyerê ji çar hêlan ve nirxand: *Wesfên çavkaniyên bingehîn ên Zapsu*, *nêrîna Zapsu a riwayetên bipirsgirêk ên 'ilma siyerê*, *helwesta Zapsu a li hember hin riwayetên ciyawaz ên der barê heman mijarê de* û *şêwaza Zapsu*. Doç. Dr. Mazhar Tunç bi teblîxa xwe ya bi navê *Abdurrahim Rahmi Zapsu'nun Hadis Kültürü (Ehl-i Sünnet Dergisindeki Tasavvuf Yazıları Özelinde)*[11] li ser çanda Ebdurrehîm Rehmî Zapsu ya hedîsê hûr bû. Tunç teblîxa xwe bi kurdî pêşkêş kir. Dr. Ferhat Çiftçi bi teblîxa xwe ya bi navê *Nirxandina Helbestên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî yên ji bo Zarok û Ciwanan ji Aliyê Hêmanên Perwerdeyê ve* beşdar bû. Çiftçi diyar kir ku Ebdurrehîm Rehmî Hekarî di nav miktesebata xwe de hin berhemên xwe ji bo zarok û ciwanan bi amanca perwerde û hînkirinê amade kirine û di naveroka wan de li gorî şert û mercên dema xwe bi piranî li ser perwerdeya olî, ehlaqî û nirxî ya zarok û ciwanan sekiniye. Mirov dikare wan berheman di qada perwerde û edebiyata zarokan de wekî gavên dîrokî bibîne. Dr. Muhammed Ragip Kaplan di teblîxa xwe ya bi navê *Têgihiştina Dînî ya Abdurrahim Rahmi Zapsu* de li ser helwesta Zapsu ya çaregeriya li hember rexneyên li dij olê sekinî. Uzm. Yunus Uygar teblîxeke bi navê *Abdurrahim Rahmi Hakkari'nin Şiirlerinin Çocuk Edebiyatı Temel İlkeleri Açısından İncelenmesi*[12] pêşkêş kir. Li ser temayên sereke, taybetiyên pedegojîk, peyamên ku daye û ziman û vegotina helbestên Hekarî bi hûrgilî sekinî.

## 2.5. Rûniştina Pêncem

Rûniştin bi serokatiya Doç. Dr. Zülküf Ergün bi rê ve çû. Di vê rûniştinê de çar teblîx hatin pêşkêşkirin. Teblîxên vê rûniştinê zêdetir li ser dahûrînên tematîk bûn. Dr. Ramazan Çeçen bi teblîxa xwe ya bi navê *Mihacirên Kurd di Nivîs û Helbestên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî de* beşdarî sempozyûmê bû. Çeçen diyar kir ku ji ber Şerê Cihanê yê Yekem nêzî nîv milyonî kurd mirine û dîsa nêzî nîv milyonî kurd ên ji bajarên wekî Erzirom, Wan û Bidlîsê jî bûne koçber. Û ev rewşa han jî di çapemeniya wê serdemê de gelekî cih girtiye, kovar û rojnameyên wekî Serbestî, Jîn û Kurdistanê ev mijara mihaciran bi awayekî piralî kirine rojevê, gelek qeyd û îstatîstîkên wan mihaciran girtine. Rewşenbîrên kurd ên li Stenbolê li ser mijarê bi dehan nivîsar û helbest nivîsîne, raya giştî hişyar kirine, bal kişandine ser halê perîşan ên wan mihacirên kurd. Ebdurrehîm Rehmî jî yek ji wan rewşenbîrên wê serdemê ye ku di çar nivîsarên xwe û çendek helbestên xwe de rasterast li ser vê meseleyê sekiniyê, bal kişandiye ser zirara mezin a kurdan ji Şerê Cihanê yê Yekem dîtî û bi vî awayî rokele sereke lîstiye. Çeçen bal kişand ser giringiya wan nivîsar, helbest, nûçe û îstatîstîkên pirjimar ên der barê beşdariya kurdan a Şerê Cihanê yê Yekem û zirara ku kurdan dî vî şerî de dîtiye.

Doç. Dr. Zülküf Ergün bi teblîxa xwe ya bi navê *Têhilkişîna*[13] *Dîn û Netewetiyê di Helbestên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî da* beşdarî kir. Ergün qala têhilkişîna/sentezkariya dîn û netewetiyê kir. Ergün Hecî Qadirê Koyî, Mîqdat Mîthet Bedirxan, Abdurrehman Bedirxan, Seîdê Kurdî, Ahmet Ramîzê Lîceyî û hwd. wekî pêşengên vê sentezkariyê nîşan dan û diyar kir ku Ebdurrehîm Rehmî Hekarî jî dûajoyê vê ramanê ye; ew jî wekî pêşeng ên wê serdemê dixwaze di zemîna rasyonelîteya zanistên pozîtîf de vê mîrateya kurdan a çandî û edebî ji nû ve şîrove bike anku rasyonalîze bike. Vê çandê dikêşe zemîna merîfeta ewropî ya serdemî, bi rêya wê ramana

10 Têgihiştina Abdurrahim Rahmi Zapsu ji Siyerê

11 Çanda Hedîsê ya Abdurrahim Rahmi Zapsu (Li dor Nivîsarên Tesewwifî yên di Kovara *Ehl-i Sunnet*ê de)

12 Dahûrîna Helbestên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî ji hêla Prensîbên Bingehîn ên Edebiyata Zarokan ve

13 Tevîhevkirin/Sentezkarî.

modernîzmê di nav kurdan de belav dike. Kirasekî dînî li van ramanên nû dike da ku muxatab (kurd) lê nesilikin, ji wan re nasyar bin. Hekarî pêşî di nava çandeke dînî û bi taybetî naxşîbendîtiyê de perwerde bûye û pişt re berê xwe daye xwendingehên modern; darul mialimîn, îlahiyat û maliye. Vê yekê jî deriyekî nû li ber wî vekiriye. Hekarî di helbestên xwe yên modern de têgehên dînî yên wekî bang, selah, spêde, nimêj, mizgeft, îblîs, xeflet û hwd. bi kar aniye û wateyên nû/modern li wan bar kiriye, di çarçoveya palemsestê de. Hekarî di berhema xwe ya bi navê *Perek Zêrîn ji Tarîxê* de bi amanca afirandina nasnameyeke bihêz a ku pala xwe dide çanda kevin, dîroka mirovahiyê ne bi Hz. Adem lê bi Hz. Nuh dide destpêkirin, Kurdistanê wekî warekî pîroz[14] nîşan dide, Hz. Mihemed wekî kurd pênase dike, Selahedînê kurd wekî rizgarkerê ummetê nîşan dide û Hulagoyê tirk jî datîne li hember wî. Hekarî, *Fermana Tenzîmatê* wekî şikandina biratiya kurdan û tirkan dibîne, têkiliya kurdan û tirkan bi metaforên gurg û berx formulîze dike; tirk (digel ereb û farisan) gurg in û kurd jî berx û ew kengî keysê dibînin diranên xwe li me kurdan tûj dikin. Herçî avakirina Komara Tirkiyeyê ye wê jî dîsa di heman çarçoveyê de dibîne. Wekî ku Antonyo Smith diyar kiriye ji miletê xwe re serdemeke *zêrîn* ava dike bi nivîsîna berhema xwe ya *Perek Zêrîn ji Tarîxê*. Metaforên edebiyata kevin ên wekî aşiq, maşûq û raqîb jî dîsa di heman çarçoveyê de, di çarçoveya palempsestê de, ji nû ve bi kirasekî modernîst şîrove dike. Aşiq di helbestên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî de dibe mirîdê neqşî/qadirî, maşûq dibe welat û netewe û reqîb jî dibe dijminên kurd û Kurdistanê.

Dr. Aydın Üneşi teblîxa xwe ya bi navê *Fikra Kurdperweriyê di Şanoya Memê Alan a Ebdurrehîm Rehmî Hekarî de* bal kişand ser leheng û mekanên şanonameyê yên bi kurdî û kurdewar û diyar kir ku replîkên şanonameyê jî dîsa bi kurdî û kurdewar in. Her wiha teswîrên mekanên şanonameyê jî bi wî awayî hatine şayesandin. Dîsa nuansên ji çanda kurdî yên wekî şîrhelalkirinê û gotinên edeb û nezaketê û gelek nîşaneyên din yên ji çanda kurdî di nava şanonameyê de xwe didin der. Ev gişk rengvedanên kurdperweriyê ne di seranserê şanonameyê de derdikevin pêşberî muxatabên xwe. Arş. Gör. Ferhat Yılmaz bi teblîxa xwe ya bi navê *Temsîla Jinê di Hizra Ebdurrehîm Rehmî Hekarî de* beşdarî kir. Yılmaz diyar kir ku di sedsala 20. de temsîla hêza siyasî diguhere, êdî temsîla hêzê ne eşîrtî û mîrîtî ye, êdî divê hêz di neteweyê de be û netewe ji jin û mêran tê pê. Neteweperwerên kurd ên wê serdemê jî bi vê refleksê jin jî têkilî vê pêvajoyê kirine û xwestine jin ne wekî berê gundî û koçer bin lê zana û xwende bin û ew wekî mamostayên neteweyî dîtine û peywira mamostayê ku zarokên kurdan perwerde dikin dane wan di rêya hizrên millî de. Ebdurrehman Rehmî di helbestên xwe û şanonameya xwe de li ser van temayan sekiniye, zarokên xwe di xwendingehên baş de daye xwendin û xwestiye jin û keçên kurd zane û xwende bin û zarokên kurd ên baş mezin bikin.

## 2.6. Rûniştina Şeşem

Rûniştin bi serokatiya Doç. Dr. Zafer Açar bi rê ve çû. Di vê rûniştinê de çar teblîx hatin pêşkêşkirin. Piraniya teblîxên vê rûniştinê li ser mijarên tematîk bûn. Prof. Dr. M. Zahir Ertekin û Doç. Dr. Bedreddin Basuğuy bi teblîxeke hevpar a bi navê *Di Berhema Büyük İslam Tarihi (Dîroka Îslamê ya Gewre) ya 'Ebdurrehîm Rehmî Zapsu de Tesewwûra Dîrokê* beşdarî sempozyûmê bûn. Teblîx ji hêla Doç. Dr. Bedreddin Basuğuy ve hat pêşkêşkirin. Basuğuy berhema Zapsu ya navborî bi gelek aliyan ve nirxand û diyar kir ku divê em vê berhemê li gorî serdema wî binirxînin. Di wê serdemê de dîroknûsî îdeolojîk bû û dîroknûsên wê serdemê dixwestin dîrokê wekî alavekê bi kar bînin. Zapsu jî berhema xwe ji ber sê sedeman; *te'essûba alîgirên îslamê, dijminên îslamê yên ku îftîrayên bêînsaf diavêjin îslamê* û *kesên bêteref jî nifûsî heqîqeyî nakin* nivîsiye û xwestiye dînê îslamê bi awayekî rast û baş were famkirin. Berhema xwe bi şêweyeke parêzwanî nivîsiye. Berhema xwe ber bi nêzî 3 hezar çavkaniyan nivîsiye û di muqaddîmeya berhema xwe de bi awayekî serkeftî qala metodolojiya dîroknûsiyê kiriye. Ev metodolojiya wî ji bo me dîroknûsên kurd rê û rêbazên bingehîn dihewîne û divê em sûdê jê wergirin. Ji zanîngeha Exeterê Dr. Farangîs Ghaderî bi teblîxa xwe ya bi navê *Poetics of an Ambivalent Modernist: Ebdurrehîm Rehmî Hekarî*[15] beşdarî sempozyûmê bû. Ghaderî teblîxa xwe bi awayê liserxetê (online) û bi zimanê îngilîzî pêşkêş kir. Ghaderî taybetmendiyên modern ên helbestên Hekarî û beşdariya wî di pêşvebirina helbesta kurdî ya modern de vedikola û diyar kir ku her çiqasî helbest di dawiya sedsala 19an de bêtir nîşana veguherînên civakî-siyasî yên Împeratoriya Osmanî bû jî, di sedsala 20an de helbest bi xwe

14 Beldetul Mubareke.

15 Poetîkaya Modernîstekî Dualî/Bêqirar: Ebdurreehîm Rehmî Hekarî

ajokarekî bihêz ê veguherînê û cihekî berhemdar bû ku tê de gotarên (discourse) civakî û siyasî dihatin avakirin û pêşvexistin. Bi vî awayî, helbest cîhekî bêhempa ji bo vekolîneke nêzîk a gotarên (discourse) civakî û siyasî yên serdest ên serdemê û têkiliya nêzîkatiyên cihêreng û reqabetkar ên modernîte û neteweperweriyê peyda dike. Vekolîneke nêzîk a metnên helbestî yên destpêka sedsala bîstan fikar, hêvî û tirsên rewşenbîrên dînî yên kurd di rûbirûbûna pirsên modernîte û neteweperweriyê de eşkere dike û beşdariya wan a mezin di pêşketina neteweperweriya kurd de ronî dike ku bi piranî di hesabê siyasî yê pêşveçûna neteweperweriya kurdî de hatiye paşguhkirin. Şîrovekirina wan a dînî ya neteweperweriyê di belavkirina wê di nav miletê kurd de roleke giring lîst. Yek ji rewşenbîrên herî giring di avakirina pênaseya îslamî ya neteweperweriyê de Ebdurrehîm Rehmî Hekarî bû, rewşenbîrê olî, rojnamevan, dramaturg û helbestvanê kurd. Vekolîna helbestên Hekarî beşdariya paşguhkirî ya rewşenbîrên dînî di pêşveçûna neteweperweriya kurdî de derdixe holê û nîşandana berbelav a rewşenbîrên dînî wekî dijminê modernîteyê û xuyangên wê dixe ber pirsê. Hekarî helbest wekî amûrek ji bo belavkirina ramanên xwe û “hişyarkirina” miletê xwe bi kar anî. Wî her wiha roleke giring lîst di ve-sazkirina têgeha welat û afirandina hesta aîdiyetê û rêzgirtina erkê parastina welat bi rêya antropomorfîzekirina wê de di edebiyata kurdî de. Dr. Şerif Güzel û Hindekar Zafer Atlı bi teblîxeke hevpar a bi navê *Rexnegiriya Civakî di Nivîsên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî yên Kovara Jînê de* beşdarî sempozyûmê bûn. Teblîx ji hêla Dr. Şerif Güzel ve hat pêşkêşkirin. Güzel li dor nivîsarên Hekarî yên kovara Jînê pêşkêşiya xwe kir. Güzel bal kişand ser serdema ku Hekarî ev nivîsarên xwe nivîsîne û diyar kir ku Hekarî wê wextê xortekî kurd e û wekî neteweperwerekî kurd derdikeve pêş. Di nivîsarên wî de temayên wekî *welatparêzî û evîna welat, nezanîn û cehalet, paşdemayîn, bindestî û êxsîrî, rola jinan a civakî* û *rexneya exlaqî û mirovî* derdikevin pêş. Lê Hekarî zêde ne romantîk e, realîst e. Dr. Ziyattin Yıldırımçakar bi teblîxa xwe ya bi navê *Analîzeke Tematîk li ser Helbestên Kurdî yên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî* beşdar bû. Pêşkêşiya xwe bi awayê liserxetê (online) kir. Yıldırımçakar li ser temayên giştî yên helbestên Hekarî hûr bû. Diyar kir ku digel temayên dînî li ser temayên *welat, hişyarkirina kurdan û heqê kurdan* û *‘ilm û nezanîn*ê disekine. Helbestên wî hissiyata neteweyî ya kurdan dide der, her wiha temayên manevî û dînî jî derdikevin pêş.

## 2.7. Rûniştina Heftem

Rûniştin bi serokatiya Doç. Dr. Ruhullah Öz bi rê ve çû. Di vê rûniştinê de çar teblîx hatin pêşkêşkirin. Teblîxên vê rûniştinê zêdetir li ser mijarên îslamî bûn. Nivîskar û vekoler Hanifi Taşkın di teblîxa xwe ya bi navê *Berawirdkirina Eqîda Ebdurrehîm Zapsu û Terîq’un Necata Mela Haşimê Miksî* de herdu Eqîde bi gelek hêlan ve berawird kirin, wekhevî û cudahiyên wan destnîşan kirin. Bal kişand ser xaleke balkêş ku di herduyan de jî ruknên îmanê li pêşiya rûknên îslamê hatine nivîsîn. Dr. Sevda Aktulga Gürbüz teblîxa xwe ya bi navê *Bir Dönemi Yeniden Okuma: Batıl Bir Tasavvuf Oluşturma Çabalarına Karşı Abdurrahim Rahmi Zapsu’nun Tepkisi*[16] pêşkêş kir. Gürbüz li ser hewlên avakirina tesewifên sexte û li ser wan hewldanan berteka Zapsu ya ‘ilmî sekinî û diyar kir ku di serdema Komarê de bi awayê endezyariya civakî humanîzmayek li ser navê *Mewlana Celaledînê Romî* û *Yunus Emre* ketibû rojevê. Zapsu jî di kovara *Ehl-i Sunnet*ê de li hember vê yekê nivîsarên balkêş dinivîsî û hewla avakirina vê humanîzma bipîlan pûç dikir. Uzm. Burak Aydın bi teblîxa xwe ya bi navê *Nirxandina Memê Alan a Ebdurrehîm Rehmî Hekarî di Peywenda Navdeqiyê de* pêşkêşî kir û li ser teoriya navdeqiyê[17] sekinî. Aydın da zanîn ku deqa jêderk a şanonameya Hekarî destaneke folklorîk e bi navê *Mem Ebasî* ye. Doç. Dr. Ruhullah Öz teblîxeke bi navê *Eqîda Ebdurrehîm Rehmî Hekarî* pêşkêş kir. Öz bi rêya Eqîdeya Kurdan a Ebdurrehîm Rehmî Hekarî nêrîna wî ya li baweriyê bi hûrgilî analîz kir.

## 2.8. Rûniştina Heştem

Rûniştin bi serokatiya Prof. Dr. Pakhshan Sabir Hamad bi rê ve çû. Di vê rûniştinê de çar teblîx hatin pêşkêşkirin. Pêşkêşiya piraniya teblîxên vê rûniştinê bi zaravayê Soranî bûn. Prof. Dr. Hamdad Hussein Bakr û Prof. Dr. Sardar Ahmad Gardi bi teblîxeke hevpar a bi navê *‘Ebdurrehîm Rehmî Hekarî û Karîgeriy Rewtekanî Edebî Nwêy Turkî*[18]beşdarî kirin. Hamdad Bakr pêşkêşî kir û li ser karîgeriya edebiyatvanên tirk ên serdemî

16 Ve-Xwendina Serdemekê: Bersiva Abdurrahim Rahmi Zapsu li ser Hewldanên Avakirina Tesewifeke Xurafeperest

17 Intertextuality, Metinlerarasılık.

18 Ebdurrehîm Rehmî Hekarî û Bandora Trendên Nû yên Edebî yên Tirkî

yên li ser Hekarî rawestiya. Prof. Dr. Umid Najmuddin Jamil Mufti û Uzm. Tara Wahbi Ghafoor bi teblîxeke hevpar a bi navê *Rehendî Ayîniy le Şî'rekanî 'Ebdurrehîm Rehmî Hekarî da Xwêndineweyekî Şîkarî*[19] beşdarî sempozyûmê bûn, Umid Mifti pêşkêşî kir û li ser aliyê dînî yên Hekarî sekinî, helbestên wî ji hêla ummetperweriya wî ve nirxand. Hindekar Waheed Neamat Ramadhan bi teblîxa xwe ya bi navê *Nasnameya 'Ebdurrehîm Rehmî Hekarî bi Rêka Têkistên Wî yên Şi›rî* beşdarî kir. Rahamdhan li ser helbestên wî sekinî, li nasnameya Hekarî vekola û dahûrînên pirhêlî kirin. Prof. Dr. Pakhshan Sabir Hamad bi teblîxa xwe ya bi navê *Memê Alanî 'Ebdurrehîm Rehmî Hekarî le Dûtwêy Rîşey Folklorî û Hunerî Şano da*[20]beşdarî kir. Di peywenda şano û folklorê de li şanonameya Ebdurrehîm Rehmî Hekarî hûr bû.

## 2.9. Rûniştina Nehem

Rûniştin bi serokatiya Dr. Mehmet Yıldırımçakar bi rê ve çû. Di vê rûniştinê de sê teblîx hatin pêşkêşkirin. Teblîxên vê rûniştinê zêdetir li ser mijarên dînî bûn. Doç. Dr. Rıdvan Kalaç bi teblîxa xwe ya bi navê *Hadislerin Anlam Dünyasına Yolculuk: Abdurrahim Rahmi Zapsu'nun Yorumsal Yaklaşımı*[21] beşdarî sempozyûmê bû. Kalaç diyar kir ku Zapsu bi rêya kovara *Ehl-i Sunnet*ê bi nivîsarên xwe yên der barê hedîsan de karekî kêrhatî kiriye û pir mifaya wî gihiştiye 'ilmê hedîsê. Zapsu wextê şîroveya hedîsan kiriye rê û rêbazeke wisa bi kar aniye ku metodolojiya klasîk û modern civandiye. Li gorî Zapsu divê hedîs, Qur'anê şîrove bikin, qaîdeyên bingehîn ên îslamê diyar bikin û rê nîşanî alimên îslamê bixin da ku bikarin jê hikmên fiqhî derînin. Zapsu hedîs ne bi tenê wekî deqên dînî dîtiye her wiha wekî hîndariyan nirxandiye yên ku der barê civakê de peyamên giring dihewînin. Dr. Shawkat al-Sindi di teblîxa xwe ya bi navê *'Ebdurrehîm Rehmî Hekarî (1890–1958) Hozanvan û Nivîsevanê Kurd: Jîn, Berhem û Dahênan*ê de li ser jiyana û berhemên Hekarî sekinî û kesayeta wî ya olî, siyasî û edebî bi hûrgilî guftûgo kir. Dr. Zhwan Abdulsalam Azeez Gardi û Hindekar Nechirwan Jasim Wali bi teblîxeke hevpar a bi navê *Le nêwan 'Eqîdey Kurdanî 'Ebdurrehîm Rehmî Hekarî û 'Eqîdey Îmanêyî Ehmedê Xanî Tiwêjîneweyekî Beranberiye*[22] beşdarî sempozyûmê bûn û herduyan digel hev pêşkêşî kirin. Eqîdeya Xanî û Hekarî bi gelek aliyan ve berawird kirin û nirxandin, wekhevî û cudahiyên wan raxistin ber çavan.

## 2.10. Rûniştina Nirxandinê

Rûniştina Nirxandinê bi serokatiya Prof. Dr. Abdulhadi Timurtaş bi rê ve çû. Prof. Dr. Abdulhadi Timurtaş, Prof. Dr. Sardar Ahmad Gardi, Doç Dr. Ruhullah Öz û nivîskar û vekoler M. Xalid Sadînî nirxandina sempozyûmê kirin. Timurtaş li ser giringiya vê sempozyûmê sekinî. Sardar Gardî diyar kir ku Hekarî wekî deryayekî ye bi tenê bi sempozyûmekê ne pêkan e hemû aliyên wî bêne ronîkirin. Bi dehan sempozyûm têrê nakin ku xebat û berhemên wî vekolin û binirxînin. Lê ev sempozyûm ji bo danasîn û diyarkirina berhemên wî û kesayetiya wî ya edebî û siyasî gelekî giring e. Sempozyûm dê wî bîne rojeya akademiyê, perdeya li ser wî û berhemên wî rake. Rexne li Cuneyd Zapsu kir ku piştî axaftina destpêkê ji salonê derket û çû, êdî venegeriya, guh neda pêşkêşiya teblîxan, beşdaran îmkan nedîtin ku wî ji nêz ve nas bikin, pirsan lê bikin. Lê li aliyê din neviyê wî Dicle Anter, kurê Musa Anter ji destpêkê heya dawiyê li salonê bû, li hemû teblîxên der barê kalikê xwe de guhdarî kir, me ew nas kir û em kêfxweş bûn. Piştî vê Timurtaş diyar kir ku em hemî jî neviyê wî yên manewî ne û li vir hazir in.

Ruhullah Öz li ser kêmasiyên sempozyûmê sekinî û diyar kir ku Hekarî ne ji Hekariyê lê ji Mêrdînê banî ba dê zêdetir bala raya akademiyê bikişanda. Dîrokê ew pişçav kiriye û nedîtiye lê bi saya vê sempozyûmê dê bêtir bê rojevê û nasîn. Hekarî kesayetekî gelekî giring e û mohra xwe li dîrokê daye. Kêmasiya herî giring ew bû ku qonaxên ku Hekarî tê re derbas bûne bi zelalî nehatin dahûrîn, ew nasnameyên wî bi kûrahî nehatin vekolan. Li gorî Ruhullah Öz sê heb Hekarî hene; Yê yekem yê serdema taliya Osmanî, yê duyem yê destpêka rejîma Komarê û yê sêyem jî yê dawîn e. Divê Hekarî di van her sê qonaxan de bê nirxandin: Evdurrehîmê ewil oldarekî nerîtparêz, hêzdar û xort e, xwîna wî dikele. Yê navîn kurdperwer e û oldar e û yê dawîn jî oldarekî rewşenbîr, laîq, hemdem û hinekî jî sekuler e. Bi guherînên van qonaxên dîrokî di ray û

19 Ruhê Dînî di Helbestên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî de - Xwendineke Analîtîk-

20 Şanonameya Memê Alan a Ebdurrehîm Rehmî Hekarî di Peywenda Folklor û Şanoyê de

21 Rêwîtiya ber bi Cîhana Wateya Hedîsan ve: Lênêzbûna Şîroveyî ya Abdurrahim Rahmi Zapsu

22 Xebateke Berawirdî di Navbera Eqîdeya (Kurdan) Ebdurrehîm Rehmî Hekarî û Eqîdeya (Îmanê) Ehmedê Xanî de

ramanên wî de guherînên mezin çêbûne. Li gorî wî rêya xelasî û biserketina ummetî perwerdehiya dînî ye lê berevajiya wî zarokên xwe di dibistanên filehan de daye xwendinê. Rexneyên tund li wezareta perwerdehiyê û mifredatê kiriye û xwestiye mifredata dînî ji hêla diyanetê ve bê amadekirin. Hekarî oldariya xelet ji bêoliyê, perwerdehiya xelet jî ji ya sekuler xeterdir dîtiye. Hekarî ji laîqiyê qayîl e ji ber ku dîn û dewlet tekilî îşê hev nabin. Öz wekî gotina dawîn hêvî kir ku arşîv û mîrata Hekarî bêne dîjîtalîze kirin û bi akademîsyen û vekoleran re bên parvekirin.

Nivîskar û vekoler Xalid Sadînî di nirxandina xwe de li ser serdema ku Hekarî derketiye ser sehneya rewşenbiriya kurdî sekinî. Diyar kir ku di bîst saliya xwe de wextê dest bi nivîsîna helbest û nivîsarên xwe dike îttîhadî li ser text in û dixwazin kurdan bikin tirk. Paşê şer derdikeve, piştî Şerê Cihanê yê Yekem û avabûna Komarê xwedî hêvî ye, di nameya xwe de ya ku ji bo Rifat Bele dişîne, vê hêviya xwe diyar dike. Lê mixabin Komar wekî hêviya wî tev nagere; di 1924an de *Qanûna Esasî*, 1925an de *Serhildana Şêx Seîd* û îdamkirina *Seyîd Evdilqadir Nehrî*, paşê *Qanûna Herbê* û *Qanûna Tekke û Zaviyeyan*, di 1927an de *Tevkujiya Zîlanê*, navê îslamê ji qanûna esasî tê derxistin, di 1930an dersên dînî tên rakirin, di 1931an de *Güneş Dil Teorisi* tê çêkirin û tirk îdîa dikin ku her kes tirk e, ji bilî tirkan tu milet tunene, maka hemû zimanan jî zimanê tirkî ye û hwd. Ebdurrehîm Rehmî Hekarî jî di vê atmosferê de berhema xwe ya bi navê *Perek Zêrîn ji Tarîxê* dinivîse û ji ber ku li hember van kirinên rejîma Komarê tu tişt ji destê wî nedihat bike, wî jî hemû pêxemberên îslamê kirine kurd. Sadînî da zanîn ku di sala 1991ê cara ewil Hazım Kılıç li ewropayê xebatek[23] li ser Ebdurrehîm Rehmî Hekarî kiriye û aniye nav rojeva kurd û misilmanan. Di destpêka Komarê de halê kurdan pir xirab e; mîrektiyên kurdan ji holê çûne, halê kurdan perîşan e, aliyê din dînê wan li holê hatine rakirinê. Bifikirin, 47 hevalê Ebdurrehîm Rehmî Hekarî di şevekê de hatine îdamkirin. Di atmosfereke bi vî rengî de kurdan jî bi vê refleksê bi sedan *eqîdename* û *mewlûdname* nivîsîne da ku bi zimanê xwe baweriya xwe biparêzin. Ev deq dikarin wekî deqên dij-kolonyal bên nîşandan.

Li gorî Sadînî rewşenbîrên kurdan piştî 1924an bûne çar bir: Qismê yekem *dijber û şoreşger bûn*, hatin cezakirin. Qismê duyem *sirgûn bûn*, qismê sêyem *devşirme bûn* yên wekî Wasıf Çınar. Yên çarem jî *bêdeng bûn,* li hêviya roja xwe man yên wekî Seîdê Kurdî û Ebdurrehîm Rehmî Hekarî. Sadînî axaftina xwe bi van gotina kuta kir: Piştî ewqas karesetan em îro gihiştine vê qonaxê, barê me giran e û em gelekî dereng mane lê dîsa jî şikur ji Xwedê re ji bo vê rojê. Timurtaş, du kêmasiyên sempozyûmê destnîşan kirin: Yek jê teblîxên li ser helbestên wî yên tirkî kêm bûn. Ya duyem jî teblîxên der barê têkiliyên wî yên bi rewşenbîrên serdema wî (têkiliya wî bi yên wekî Seîdê Kurdî re û hwd.) de kêm bûn. Timurtaş hêvî û daxwaz kir ku vekoler nivîsarên di van qadên berbehs de jî bişînin da ku di pirtûka sempozyûmê de cihwar bibin û diyar kir ku ev teblîxên ku di sempozyûmê de hatine pêşkêşkirin, dê paşê wekî pirtûk, ji nav weşanxaneyeke navneteweyî bên çapkirin da ku bibe çavkaniyeke sereke di vî warî de. Dawiya dawîn Timurtaş libo libo spasiya kedkarên sempozyûmê kir û sempozyûm piştî kêşana wêneyên giştî qediya.

## 3. Analîza Tematîk a Rûniştinên Sempozyûmê

Teblîxên ku di çarçoveya Sempozyûma Kurdiyatê ya Navneteweyî de hatine pêşkêşkirin di neh rûniştinên sereke de hatine komkirin. Dema ku ev rûniştin li şûna pergaleke kronolojîk a klasîk, li ser eksenên tematîk û têgehî werin analîzkirin, naveroka sempozyûmê dikare bi awayekî zelaltir û tevdeyî were nirxandin. Ev xebat dê li jêr nirxandinan bike li gor komên tematîk ên ku bi berçavgirtina wekhevî û cudahîyên di navbera rûniştinan de hatine sazkirin.

### 3.1. Koma 1. Ebdurrehîm Rehmî Hekarî di Peywenda Ramana Kurdî û Edebiyata Kurdî ya Modern de

Teblîxên ku di rûniştinên 1, 2, 3 û 6an de hatine pêşkêşkirin dikevin bin banê vê komê. Analîza helbestan, rola helbestê di modernbûnê de, vegotina şanoyî, têkiliya folklorê ya bi formên din ên edebî re mijarên sereke yên wan rûniştinan bûn. Di van rûniştinan de, nivîsên Hekarî ne tenê ji hêla dîrokî ve lê di heman demê de ji hêla perspektîfên estetîkî, siyasî û epistemolojîk ve jî hatin dahûrîn. Teblîxvanan di avakirina têgihiştina helbesta

23

modern de bi taybetî bal kişandin ser hevsengiya di navbera “hişyarbûna hestiyarî” û “hişmendiya neteweyî” de. Pêşkêşiya bi îngilîzî ya Farangis Ghaderi bi pênasekirina Hekarî wekî “modernîstekî dualî” perspektîfeke teorîk a nû pêşniyar kir ji bo civata akademiyê.

### 3.2. Koma 2. Nêzîkatiyên di Peywenda Nasnameya Îslamî, Perwerdehiya Dînî û Nerîta Tesewifî de

Teblîxên ku di rûniştinên 4, 5, 7 û 9an de hatine pêşkêşkirin dikevin bin banê vê komê. Berhemên Hekarî yên li ser siyer, hedîs û eqaîdê; nêzîkatiya wî ya bi tesewifê re; avakirina civak û takekesan bi rêya perwerdehiya dînî mijarên sereke yên wan rûniştinan bûn. Di van teblîxan de, nasnameya dînî ya Hekarî wekî “ramanwerê ummetê” hat binavkirin; lêbelê, hat tekezkirin ku di navbera hişmendiya wî ya neteweyî û vî aliyê wî yê dînî de ne ku nakokiyek lê sentezek heye. Di hin teblîxan de, gotarên (discourse) dînî di asta lîteral de hatin şîrovekirin û veguherînên îdeolojîk ên nivîsarên Hekarî bi têra xwe nahetin vekolîn. Di van rûniştinan de, analîzên der barê temsîliyeta jinan de sînordar bûn; di çarçoveya zayendê de analîzên kûrtir dikarîbûn bihatana kirin.

### 3.3. Koma 3. Folklor, Bîra Civakî û Pratîkên Vegotinê

Teblîxên ku di rûniştinên 3, 6 û 8an de hatine pêşkêşkirin dikevin bin banê vê komê. Şanoya Memê Alan, destanên folklorîk, pêvajoya veguhestina vegotinên gelêrî bo edebiyata modern mijarên sereke yên wan rûniştinan bûn. Analîzên ku bi taybetî li ser şanonameya bi navê *Memê Alan* hatin kirin nîşan dan ku folklor ne tenê estetîkeke aîdî rabirdûyê ye, lê di heman demê de çavkaniyeke damezrîner e ji bo ve-nûsîna nasnameya neteweyî. Dîsa analîzên der barê temsîla jinê de sînordar bûn di van rûniştinan de û analîzên kûrtir dikaribûn di çarçoveya zayendê de bihatana kirin.

### 3.4. Koma 4. Mîsyona Hekarî di Peywenda Perwerde û Pedagojiyê de

Teblîxên ku di rûniştinên 4. û 5. de hatine pêşkêşkirin dikevin bin banê vê komê. Helbestên Hekarî yên ji bo zarokan hatine nivîsîn, giringiya perwerdehiya exlaqî, avakirina hişmendiya pedagojîk bi rêya zimên, mijarên sereke yên wan rûniştinan bûn. Hat dîtin ku Hekarî ne tenê mirovekî edebiyatnas e, lê di heman demê de mîmarekî perwerdehiyê ye jî. Her wiha ew, bi naverokên didaktîk di navbera ziman, exlaq û hişmendiya neteweyî de ji bo zarokan pêwendiyan jî ava dike. Balkêş e ku helbestên wî yên ji bo zarok û nûciwanan hatine nivîsîn li gor prensîbên edebiyata zarokan xwediyê fonksiyonên pedagojîk in.

### 3.5.Koma 5. Nasname, Neteweperestî û Konjektura Civakî-Siyasî ya Serdemê

Teblîxên ku di rûniştinên 2, 5 û 6. de hatine pêşkêşkirin dikevin bin banê vê komê. Nasnameya kurdî, pevçûna di navbera ummet û neteweyê de, temsîlkirina jinan, bîra dîasporîk û sirgûn, mijarên sereke yên wan rûniştinan bûn. Xalên hevpar û dijber ên avakirina nasnameya neteweyî û ramana îslamî ya piştî serdema Osmanî di helbest û nivîsarên Hekarî de, hatin nîqaşkirin. Xwendinên ku bi taybetî li ser sirgûn, koçberî û zimanên bindest hatin kirin nîşan dan ku pratîka edebî ya Hekarî ji aliyekî ve erka celebekî dîroknûsiyê jî pêk aniye.

## 4. Aliyên Erênî û Neyînî yên Sempozyûmê

Sempozyûma Kurdiyatê ya Navneteweyî, platformeke nîqaşê ya piralî pêşkêş kir ku ji hêla naverokê ve dewlemend bû. Sempozyûm, wekî çalakiyeke berfireh derkete pêş ku hem dahûrînên edebî, hem ên ramana dînî û hem jî yên civakî-çandî bi hev re hatin nîqaşkirin. Fokûsa tevahiya sempozyûmê li ser Ebdurrehîm Rehmî Hekarî bû, vê jî hişt ku aliyên cuda yên kesayetekî piralî bi awayekî hevdemî bê nîqaşkirin. Ev nêzîkatiya tevdeyî rê da analîzên kûr ên ku di nerîta rewşenbîrî ya kurdî de kêm caran tên dîtin. Vekolerên ji warên cuda yên wekî îlahiyat, edebiyat, dîrok, civaknasî, perwerdehî, jîneolojî û folklorê îmkan dan hem cihêrengiya akademîk û hem jî têgihiştineke piralî ya mijarê. Bi saya beşdarên ji welatên cuda yên wekî Iraq, Îngilîstan û Swîsreyê, sempozyûm ne bi tenê di çarçoveya Kurdiyata Tirkiyenavendî de, lê di çarçoveyeke Kurdiyata navneteweyî de jî hate nirxandin.

Yek ji destkeftiyên herî giring ên sempozyûmê nêzîkatiya wê ya navdîsîplînî bû. Lêbelê, ve-sazkirina avaniya rûniştinê bi yekparebûnek tematîktir dikaribû têkarî bi kûrkirina nîqaş û analîzên berawirdî bikira. Wekî mînak, her çendî nasnameya Hekarî wekî helbestvan, kurdperwer, aliyê wî yê perwerdehiyê, helwesta wî ya rewşenbîrî ya ummetperweriyê bi awayên cuda cuda hatibin nîqaşkirin jî; di navbera van aliyên wî de alozî an jî entegrasyonên çawa hebûn, ev tişt bi awayekî zelal nehatin guftûgokirin.

Ji ber ku kovara *Ehl-i Sunnet*ê negihişte ber destê vekoleran, malpera İDP[24]yê ne çalak bû, ew aliyê Ebdurrehîm Rehmî Hekarî lawaz ma. Dîsa teblîxên serdema Komarê li gorî yên serdema Osmanî kêm bûn, ev jî yek ji aliyê lawaz ê sempozyûmê bû. Dîsa nebûna hin teblîxên di warê zimannasiyê (linguistic) de di rûniştinan de xwezaya navdîsîplînî ya sempozyûmê qels kir.

Ji ber ku di salona *Navenda Çandê ya Prof. Dr. Cengiz Andiç*ê de pergala wergera hemdemî (simultaneous) tunebû, wergera teblîxên bi zimanên biyanî nehatin kirin. Lê her çiqasî îmkana wergera hemdemî tunebû jî dîsa lijneyê dikaribû bi pêş de tedbîra xwe bigirta, wergera hevpişt (consecutive) organîze bikira. Beşdaran bi kurdî zanîbû û wan ji diyalektên kurmancî û soranî jî kêm-zêde fam dikir lê teblîxeke bi zimanê îngilîzî hebû û kêm kesan karî jê fam bike. Dîsa beşdarên ji Herêma Kurdistanê hatibûn ji ber ku bi tirkî nedizanîn wan ji teblîxên bi zimanê tirkî tu tişt fam nekir, hewce bû teblîxa bi îngilîzî û yên bi tirkî bi wergera hevpişt bihatana wergerandin. Vê yekê jî adaniya sempozyûmê kêm kir, bû sedemê qelsbûna danûstana zanyariyan.

Ji ber ku sempozyûm di dema ezmûnên fînalê ya xwendekarên zanîngehê de çêbû, dîsa ji ber ku xwendekarên beşa lîsansê ya Ziman û Edebiyata Kurdî hêj tunene û sempozyûmên kurdiyatê zêde bala xwendekarên beşên din nakişînin, beşdariya xwendekaran pir sînordar bû. Eger çalakiyeke akademîk nikarîbe bi vekolerên ciwan re bicive, hem ji hêla têkiliyê ve û hem jî ji hêla veguhastina mîrata zanistî ve kêmasiyeke giring e.

Di hin teblîxan de, tenê aliyê edebî yê Ebdurrehîm Rehmî Hekarî li şûna kesayetiya wî hatiye sekinandin. Lêbelê, dê baştir bûya ku herdu aliyên wî yên siyasî, çandî û rewşenbîrî bi awayekî wekhev bi perspektîfeke tevdeyî werin guftûgokirin. Dîsa serenavên hin teblîxan pir nêzîkî hev bûn an jî dubare bûn ev yek jî bû sedema kêmbûna cihêrengiyê di warê naverokê de. Vê rewşê jî kir ku tîrtiya tematîk a di navbera rûniştinan de qels bibe.

Di axaftinên destpêkê de cih nedan neviyê Ebdurrehîm Rehmî Hekarî, Dicle Anter, ku ji bo sempozyûmê hatibû vexwendin, ev yek jî kêmasiyeke berbiçav bû. Bi taybetî, temsîliyeta bibandor a kesên ji malbata Ebdurrehîm Rehmî Hekarî dê ji hêla çarçoveya dîrokî û hestiyarî ya sempozyûmê ve bi qîmettir bûya.

Hin serokên rûniştinê têra xwe amade û baldar nebûn, vê yekê jî bandoreke neyînî li ser herikîna rûniştinan kir. Hin serok qet beşdarî rûniştina xwe nebûn û li şûna wan di kêliya dawî de bi neçarî kesên din hatin wezîferdarkirin.

Ji Kurdên Sûriyeyê tu kes beşdarî sempozyûmê nebûn, vê yekê jî di warê temsîliyeta herêmî de valahiyek cidî çêkir. Her çendî ji ber sedemên siyasî be jî, vê rewşê karakterê navneteweyî yê sempozyûmê qels kir.

Li derveyî Herêma Kurdistanê, beşdariya fîzîkî ji Îran, Amerîka û Ewropayê, pir kêm bû. Beşdarên ji welatên biyanî yên heyî jî liserxetê (online) beşdarî sempozyûmê bûn. Ev rewş potansiyela sempozyûmê kêm kir ku bi civaka zanistî ya cîhanî re têkiliyeke bêtir ava bike.

Hin rûniştin pir qerebalix bûn û gelek pêşkêşvan neçar man ku di demeke kurt de teblîxên xwe pêşkêş bikin. Vê rewşê hem kalîteya pêşkêşiyan kêm kir û hem jî têkiliya temaşevanan sînordar kir.

Di navbera rûniştinan de tenê navberek kurt a panzdeh deqîqeyî hebû, ku dema bêhnvedan û amadekariyê ya hem axaftvanan û hem jî temaşevanan sînordar dikir. Di heman demê de, hawîrdorek bo danûstandin û nîqaşê ya watedar nehat peyda kirin. Divê herî zêde sê teblîx di her rûniştinê de hebin û divê demek taybetî ji bo rûniştina pirs û bersîvê di dawiya her rûniştinê de were veqetandin. Ev yek dê hawîrdora nîqaşa akademîk xurtir bike.

Her çendî weşana zindî ya sempozyûmê li ser *YouTube*yê avantajeke gelekî giring be jî, divê rêxistina arşîvê û kalîteya tomarkirinê bê qenckirin, bi vî rengî ew ê ji bo kesên ku nekarîn beşdarî sempozyûmê bin bibe çavkaniyeke zanistî ya demdirêj.

24 İslami Dergiler Projesi, Url3 : https://idp.org.tr/yapim-asamasi/

Ji ber ku şanonameya Ebdurrehîm Rehmî Hekarî ya bi navê *Memê Alan* yekem şanoya kurdî bû, sempozyûm li ser nivîskarê vê şanoyê û mîrasa wî ya çandî bû, dîsa gelek teblîxên sempozyûmê der barê vê şanoyê de bûn, çavê temaşevanan lê bû ku di dawiya sempozyûmê de şanoya *Memê Alan* li ser dikê bê lîstin da ku ew agahiyên der barê şanoyê de ne tenî di biwarekî akademîk de bimîne, bi lîstina şanoyê bi goşt û hestî bin lê mixabin lijneya lidarxistina sempozyûmê ev detay nedabû ber çav, şano nehate lîstin. ev jî yek ji kêmasiyên sempozyûmê bû.

Di seranserê sempozyûmê de hat dîtin ku meyla guhdar û beşdaran li ser bi zimanê kurdî pêşkêşkirina teblîxan bû. Wextê yek-du teblîxvanên kurd xwestin bi tirkî pêşkêşiyê bikin, ji hêla guhdaran ve rica ji wan hat kirin ku pêşkêşiyên xwe bi kurdî bikin. Dîsa peyamên giring ji bo perwerdehiya bi zimanê kurdî hatin dayîn. Wextê qala perwerdehiya bi zimanê dayîkê dihat kirin, guhdaran bi çepikan meyl û şanaziya xwe nîşan dida.

## Encam

VI. Sempozyûma Kurdiyatê ya Navneteweyî organîzasyoneke akademîk a giring bû ji bo nirxandina kesayetiya piralî û mîrata çandî ya Ebdurrehîm Rehîm Hekarî bi nêzîkatiyeke navdîsîplînî. Teblîxên ku hatine pêşkêşkirin hem bandora Ebdurrehîm Rehîm Hekarî ya li ser cîhana ramana îslamî û hem jî cihê wî di avakirina edebiyata modern a kurdî de bi awayekî piralî nîqaş kirin. Nîqaşên ku di seranserê sempozyûmê de hatin kirin, ne tenê di warê têgihiştina berhemên Hekarî de bûn di heman demê de serdemên ku Hekarî tê de jiyaye ji hêla civakî, siyasî û çandî ve jî hatin nîqaşkirin.

Ji bilî xurtkirina eleqeya akademîk a bi ziman, edebiyat û dîroka ramanê ya kurdî re, vê sempozyûmê roleke giring lîst di veguhestina mîrata piralî ya rewşenbîrên kurd ya bo nifşên siberojê de. Beşdariya ji welat û dîsîplînên cûda sempozyûm anî asteke navneteweyî; ev nîşaneya vê yekê ye ku qada Kurdiyatê her ku diçe dibe qadeke akademîk a bihêztir. Lidarxistina sempozyûmên wihareng li ser kesayetên pêşeng ên wekî Ebdurrehîm Rehmî Hekarî dikin ku zanîna me ya dîrokî ji nû ve bê şîrovekirin û cihekî mayînde di bîra zanistî de bigire.

Di vê sempozyûmê de hat dîtin ku Ebdurrehîm Rehmî Hekarî rewşenbîrekî kurd ê piralî ye. Hem di serdema dawiya Osmanî hem jî destpêka Komarê de jiyaye, wekî şa'ir, rewşenbîr, nivîskar gelek nivîsar û berhemên giring nivîsîne û bi van berhemên xwe bûye şahidekî baş ê serdema xwe. Di vê sempozyûmê de bi gelek teblîxan aliyên cuda yên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî hatine nirxandin û nasandin. Helbet kêmasiyên teblîxan û sempozyûmê hebûn lê hêvî ew e ku ev sempozyûm bibe pêngavek di nirxandin û nasandina berhem û kesayetiya Ebdurrehîm Rehmî Hekarî de û ji bo gotarên akademîk, panel û sempozyûmaên cihêreng derîyekî nû veke.

Bi vê sempozyûmê ev qinyat hasil bû ku divê her şa'ir, nivîskar û rewşenbîrekî kurd bi taybetî yên di serdema Ebdurrehîm Rehmî Hekarî de jiyane anku hem serdema dawiya Osmanî dîtine, hem jî di serdema Komarê de jiyane û şahidiya wan herdu serdeman kirine; her yek ji van bi berhem, kesayetî û çalakiyên xwe bibin temayên panel, sempozyûm û gotarên akademîk.

Sempozyûma Kurdiyatê ya Navneteweyî bi nîqaşkirina mîrata rewşenbîrî ya pirtebeqeyî ya Ebdurrehîm Rehîm Hekarî di çarçoveya dîsîplînên wekî dîrok, edebiyat, îlahiyat, folklor û perwerdehiyê de, hem têkarî li dîroka rewşenbîrî ya kurdî û hem jî edebiyata kurdî ya modern kiriye. Nivîsarên Hekarî yên hem ji aliyên ummetperwerî û hem jî neteweperwerî ve hatine şekildan, di gelek teblîxên ku di sempozyûmê de hatine pêşkêşkirin de ji perspektîfên cuda ve hatin analîzkirin, bi vî rengî van teblîxan li ber têgehkirinên nû yên bîra takekesî û kolektîf rê vekir.

Cewhera navdîsîplînî ya sempozyûmê, digel cihêrengiya teorîk û beşdariya navneteweyî, rê li ber atmosfereke akademîk a kûrtir û berfirehtir vekir di warê Kurdiyatê de. Lêbelê, divê hin kêmasiyên organîzasyonê, nemaze temsîla akademîsyenên jin, plansaziya rûniştinan û derfetên sînorkirî ji bo nîqaşên kûr ên teblîxan, wekî warên giring ên ji bo başkirinê di sempozyûmên siberojê de werin destnîşankirin.

Sempozyûmên bi vî rengî yên tematîk ên ku li dora kesayetiyên wekî Ebdurrehîm Rehmî Hekarî têne lidarxistin, ne tenê di avakirina rabirdûyê de di heman demê de di avakirina siberojê de jî têkariyê dikin. Ev nîqaşên ku bi rêya helbest, şanoname, nivîsarên perwerdeyî û dînî yên wî têne kirin, mîrateyeke rewşenbîrî ya kûr a

der barê pirsgirêkên nasname, ziman û çanda civaka kurd de derdixin holê. Di vî warî de, divê sempozyûm ne tenê wekî çalakiyeke zanistî, lê di heman demê de wekî polîtîkayeke bîrê û celebeke berxwedana çandî jî were nirxandin.

Berhevkirin û weşandina gotarên ji sempozyûmê hatine bidestxistin ji bo veguhestina nîqaşan ji raya giştî û vekolerên siberojê re pir girîng e. Ev bûyer, ku di sazûmankirina vekolînên Kurdiyatê de qonaxeke hêja ye, xwedî potansiyel e ku ji bo sempozyûmên siberojê hem ji hêla cihêrengiya metodolojîk û hem jî ji hêla kûrahiya rexneyî ve wekî modelekê xizmetê bike.

## Jêder

Eminoğlu, N. (2023). Nirxandina IV. Sempozyûma Navnetewî ya Kurdiyatê: Melayê Cizîrî û

Mîrasa Wî. Kurdiyat(7), 75-79.

Çakar, S. (2024). Mela Mehmûdê Bazîdî & Aleksandre Auguste Jaba û Mîrasa Wan.

Kurdiyat(9), 113-120. https://doi.org/10.55118/kurdiyat.1495360.

Url1, (2025). https://www.youtube.com/@kurdiyatdergisi/streams.

(Dîroka Xwegihanê: 02.06.2025).

Url2, (2025). https://tr.wikipedia.org/wiki/Edward_William_Charles_Noel.

(Dîroka Xwegihanê: 02.06.2025).

Url3, (2025). İslami Dergiler Projesi, https://idp.org.tr/yapim-asamasi/

(Dîroka Xwegihanê: 02.06.2025).

Zapsu, A.R. (2023). Abdurrahim Rahmi Zapsu Çok Yönlü Bir Tanıklığın Öyküsü (Lêkolîn.

Necat Zanyar). İstanbul: Doğan Yayıncılık.